-Hûn dikarin kurtejiyana xwe ji xwendevanan re bidin nasîn ?

Jiyaneke min î zêde dewlemend nîne ku xwendevan marîfetekê jê werbigirin.

Lê ji Erxeniya Diyarbekirê me. Di zaroktiyê de li zikê Diyarbekir û Nisêbînê mame û dûre jî heft salan li Mersînê.

Di xortaniyê de şoreşgerî û zîndan bûne para min û dûre jî rêya pêşmegetiyê li ber min vebûye. Sê salan li Îran û Iraqê (li navçeyên Kurdistanê) bûme pêşmerge.

Û dûre jî li rojavayê Kurdistanê bi qasî sê mehan li Qamîşloyê û demeke kurt jî li Şamê mame.. Di sala 83’an de derketime, û ev sî û pênc 35 sal in li Swêdê me.

-Tu çawa û kengê bi ser şopa nivîsînê ve bûyî?

Nivîsîn hebû, lê ne bi maneya gotinê. Piştî ku ji welêt derketim, pirsa nivîsandinê her di ruhê min de hebûye û min gelek nivîsandiye jî, gername û bîranîn in… lê ne bi maneya ku ew ê weke kitêb çap bibin. Çap nebûne… naxwazim ew çap jî bibin.

Lê nivîsandina berhemên edebî û hunerî, ez bawer dikim di sala 1980-81’ê de bû. Piyesek(Şano) bû… wê çaxê li Başûr pêşmerge bûm, min nivîsand û weke piyesekê min ew li sahneyê jî raxist… Mam Celal Talebanî û Hêro Xan jî ji wan du ezîzên cema’eta hazir bûn ku temaşeyê evê piyesa(Şano) min kirin. Te jî weke gelekan pirsa destpêka nivisîna min kir, loma min behsa evê yekê kir… û ev yeka hîn jî ji bo min weke bîranîneka xweş e. Lê berdewamiya evê nivîsan-.dina hunerî min li Swêdê kir

- Çîroka nûjen li nik Kurdan (Kurteçîrok-Kurtenovel) dîroka wê vedigere kengê?

Dibêjin di salên 1912, 1913, 1916’an de (Ev jî xemgîniyeke bêdezgehî û bêdewletiya me Kurdan e) ezîzekî bi navê Fû›ad Temo bi forma kurtenovelê tiştek nivîsîye.

Lê baştir e lêkolînerên edebiyata Kurdî behsa vê yekê bikin, ne ku ez behs bikim. Ez ne lêkolîner im.

- Sedemên bijartina te ji novel û romanê re çi bûn?

Ne roman, lê novelên kurt û dirêj… ez lê hizirîm ku forma herî baş û çêtir ji bo derbirîna min forma novelê ye. Dibe ku ji ber evê yekê be



min ev forma edebî hilbijartiye.

- Zimanê Kurdî têra wê yekê dike ku kurteçîroka Kurdî bigihîne asta yên cîhanî?

Ez bawer dikim di nivîsandinê de kêmasiya tu zimanekî nîne. Hemî ziman dikane derd û daxwazên xwe bi rêya edebiyatê bi şêweyekî bilind jî der bike. Di edebiyata kurdî de jî gelek berhem hene ku ji asta edebiyata dunyayê ne kêmtir in. Pêwîst nake em xwe ji xelkê kêmtir bibînin.

- Her zimanekî taybetmendiyên wê hene, li gorî te xweşî û nasnameya zimanê Kurdî çi ye?

Di dîrokê de merivên mezin, merivên zana, merivên çê û maqûl ji nava kurdan derketine... û hukumdarî jî kirine. Lê bi daxewe, tu wextekê jî rûmet nedane zimanê xwe yî kurdî. Naxwazim têkevim hûrguliyên vê yekê. Lê li gel gelek astengî, yasax û şertên dijwar jî zimanê kurdî xwe li ber evê kaos(Tevlihevî), krîz û felaketa dîrokî girtiye û heta roja îro hatiye. Dibêjim dibe ku taybetmendî û pîroziya zimanê Kurdî jî tenê ev be.

- Ta niha çend berhemên we hatine çapkirin, û çi li ber destên we heye?

Çar berhemên bi forma dirêj û çar berhem jî ji kortenovelan hene… û gernameyek. Nivîskar weke mirîşkên bi hêk in (li ser navê xwe dibêjim), kengî û li çi wextê ew ê hêka xwe bike meriv nizane. Li ber destê min jî tişt hene… lê anuha naxwazim behs bikim.

- Rexnevan dibêjin ku di romana Labîrenta Cinan de, Hesenê Metê di hizr û ramanên xwe de radîkal û reşbîn e, ji bo vê yekê tu çi dibêjî?

Di destpêkê de Xwedê bawer kir ku Wî ka’înat bêqisûr afirandiye. Lê dema ku di afirandina xwe de hay ji qisûr û kêmasiyekê bû, rabû gotin belav kirin û got: ez peşîman bûm.(Tewrat)

Ku ez bêm ser pirsa te: Ne tenê di Labîrenta Cinan de, belbî di hemû nivîsên xwe de jî reşbîniya min heye û ev jî rastiyek e. Ku min bawer bikira ji çêbûna ka’înatê, ji pergala çerxa dunyayê heta evê roja ku ez lê dijîm… ku her tişt baş û bêqisûr bûya, sond dixwim min ê tiştek nenivîsanda.

Lewra wê çaxê min ê pêdivî bi nivîsê nedaya. Nivîs û nivîsandin ji qisûrekê, ji kêmasiya tiştekî û ji reşbîniyekê afiriye. Ku her tişt li gor dil û daxwaza Xwedê bûya, Wî yê gotinên xwe di kitêbên pîroz de ji me re neşanda. Ez wusa difikirim, dibêjim nivîs ji ber qisûr û kêmasiyekê afiriye.



- Di barê zimanê Kurdî de, herî zêde hûn çi astengiyan di nivîsînê de dikêşin?

Di nivîsandina zimanê kurdî de ez tu astengiyê nabînim. Lê astengiyeke zimanê Kurdî ew e ku Kurdan bi xwe qedir û rûmeteke pêwîst nedane zimanê xwe. Astengiya herî mezin ev e.

- Te zêdetir ji carekê gotiye ku sedemên lipaşmayîn an jî rabernebûna giraniya wêjeya Kurdî her xwendekar e, gelo ji bilî xwendekar çi sedemên din hene?

Dema ku dibêjim xwendevan, bêguman qesta min ne ew tişt e ku bibêjim keç an jî xortekî xwendevan.

Li vir qest û mebest miletek e, kulturek e, hukumek e, dewlet û îdareyek e, mal û malbatek e. Tunebûn û kêmasiya evan mefahimên civakî hiştiye û hîn jî dihêle ku edebiyata Kurdî jî weke gelek marîfetên kurdî nav û deng venede û negêhîje cîhê xwe yî pêwîst.

- Tê zanîn ku Hesenê Metê nivîskarê êşê ye, ji ber çi êş?

Ez baş nizanim bê ew çima welê dibêjin. Lê ez bawer dikim, ez tiştên rast, rojane û rasyonel (Mentiqî) dinivîsim: jiyana rastîn.

Dibe ku ew kes êşeke xwe, êşeke der û cîranên xwe di nivîsên min de hîs dikin ku loma welê dibêjin.

- Li gorî şopandina we, rewşa nivîs û edebiyata Kurdî li Rojavayê Kudistanê gihaye çi astê?

Derfetên min û şopandina edebiyata rojavayê Kurdistanê bi sînor e. Û bêguman edebiyata parçeyên din jî bi awayekî pêwîst nikanim bişopînim. Lê li gor agahiyên min û ew berhemên ku bi dest min dikevin, dibînim ku asta edebiyatê li rojavayê Kurdistanê jî baş e: Navên weke Ehmed Huseynî, Fewaz Husên, Jan Dost, Helîm Yûsif, Şahînê B.Soreklî… (û bêguman hinekên ku min hay jê nine jî hene) di asteke bilind de ne.

-Gelo Xwendevanê Romanê bi zimanê Kurdî hene?

Weke îstatîstîk(Amar) ez nizanim ka çiqas xwendevan hene, lê çi qas be jî li gor rewşa heyî, min qebûl e.

-Der heqê van kesayetan dikarin çi bêjin : Helîm Yûsiv – Seydayê ceger Xwîn – Konê Reş – Mihemed Uzun – Yaşar Kemal?

Di warê edebî de her yek ji van kesan maqûl û ezîzek e, her yek ji wan şerabeke bi reng û lezeteke xwe yî xas e. Lê ez naxwazim bahsa kesayetiyan û şexsiyetan bikim.

-Tu xwe di çîrok, helbest, gotar, lêkolîn, şano, yan romanê de dibînî ?

Wek ku min got, bi şanoyê destpêkeke min a amatorî an jî mejbûrî çêbû. Lê bêtir xwe bi novelê bilî dibînim.

-Bajarê Amedê, bîranîn, ax, pêsîrên dayê û şîr... Ev gotin, ji bo te çi ne?

Ji bo min her tişt xewn, her tişt xeyalên demekê ne.



Xewn û xeyalên xweş, lê baş dizanim ku anuha nemane. Ne ew lazet, ne ew marîfet.

-Ji bîranên te yên pêşmergetiyê, herî zêde çi li bîra te ye?

Min gelek bîranînên pêşmergetiyê hene: xweş û naxoş… lê dixwazim bila di dilê min de bimîne.

-Di jiyana xwe de tu li çi poşman bûyî?

Bila ev jî li ba min bimîne, xêra bersiva vê pirsê jî ji kesekî re tune ye.

-Der barê şer û bûyînên ku aniha li Rojavayê Kurdistanê li dar in, hûn çi dibêjin?

Ez tiştên baş nafikirim, lê dibêjim: Hêvî dikim rojek ji rojan aramiyek çêbe, ev hemû êş û azar sivik bibe, bi dawî bibe.

-Gotina Dawî…

We hemêz dikim, sipas û silametiya we hemûyan dixwazim.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

BERXWEDANA ZIMANÊ KURDÎ Û XETERA NIHA

Zeynelabidin ZINAR

Tiştên herî pîroz û nirxdar ku netewe û miletan ji mirina hertimî diparêze, bêguman çand û toreya nijadî ya wan e. Xasma jî ziman pir girîng e, lewra ziman Rihê Netewî ye. Ev yek bêguman ji bo Kurdan jî her sufte ye.

Li gora hin belgeyan, tê gotin ku dema Osmaniyan 18 û dema Komara Turkyayê jî 19 serhildanên Kurdan çêbûne. Çi dema ku serhildanek hatiye rûxandin, perçiqandina zêdetir li Çanda Kurdî hatiye kirin û Zimanê Kurdî wêran kirine.

Lê belê Ziman û Çanda Kurdî, her tim berxwedaneke pir mezin daye nîşandan û xwe parastiye. Dijminan kirine û nekirine, nikaribûne zimên tune bikin.

Sedem jî ev bûye: Çanda Kurdî pir dewlemend e, ziman dewlemendtir e, her peyveke kurdî ku navê tiştekî ye, çend hevwateyên wê jî hene, weke SIVNIKê ku tenê bi kurdiya kurmancî 16 navên wê hene û hevwateyên peyva SERHIŞKiyê jî deh peyv in.

Zimanê Kurdî xwe bi çar saziyên xwe yên kurdewarî parastiye, weke Medreseya Kurdî, Dîwana Axatiyê, Tekyaya Şêxantiyê û Dibistana Zindî (dengbêj û çîrokbêj). Lê sal 1980'yî bi Cuntaya Faşîst a Turkyayê re, parastina wan saziyan ber bi rûxandinê ve çûye.

Îro çi bi alîkariya desthelatiya başûrê Kurdistanê be, çi jî bi xêra hin derfetên erênî yên li Tirkyayê bin, di van 10-15 salên dawîn de, Çanda Kurdî gelek berepêş çûye û diçe. Lê mixabin li bakûrê Kurdistanê ew berepêşiya zimên, her ku diçe ji rêya naveroka xwe averê dibe û ber bi rengekî dî ve diçe.

Îro tê dîtin ku li bakûrê Kurdistanê û li Tirkyayê, jimara kesên ku bi Zimanê Kurdî dinivîsin, ji sed hezarî gehaye 7500'î belkî jî zêdetir bûye. Lê mixabin di vê zêdebûn û pêşketinê de, Zimanê Kurdî ji bingeha xwe, ji nasnameya xwe dûr dikeve û naverok û qalibê zimanên biyanî werdigire. Wek mînak, Çanda Turkî ku efare ye û ji gelek zimanên biyanî hatiye berhevkirin, dikeve nêv Zimanê Kurdî, her wiha tîna xwe li axaftina rojane ya Kurdî dike û reng û qalibê Zimanê Kurdî dide guhartin.

Çend mînakên berbiçav ku di van rojan de li Medyaya Kurdî hatine weşandin û di wan de gelek şaşî û xeletiyên beloq hene ku bi çu rengî nayêtin pejirandin, bê ku navê xwediyan eşkere bikim, eve çend li jêrê ne:

YEK: "BÊ DEWLET BUN BÊ XWEDÎ BUNE"

Ev hevok di rastiya xwe de du peyv in, lê bi şeş peyvan hatiye nivîsandin û tê de deh şaşî hene. Rastiya wê wiha ye: "Bêdewletbûn, bêxwedîbûn e."

DIDO: "Zeytûnê Efrînê jî navdare…"

Eger li Efrînê tenê libek zeytûn hebûna, hingê du şaşî tê de dihatin dîtin. Yek, zayenda "zeytûn"ê mê ye, lê jê re ya nêr hatiye nivîsandin. Ya din, peyvika "navdar" rengdêr e, divê lêker ku "e" ye jê cuda be.

Rastiya hevokê li gor rewşa xwe ya niha divê weha be: "Zeytûna Efrînê jî navdar e…"

Îcar ji ber ku çênabe li Efrînê tenê libek zeytûn hebe, nexwe divê weha be: "Zeytûnên Efrînê jî, navdar in…"

SISÊ: "Çend caran di dilê minde erd hejîya…"

Di vê hevokê de sê şaşî hene. Rastiya hevokê wiha ye: "Çend car erd di dilê min de hejîya..." Îcar di rastiya xwe ya bingehîn de divê weha be: "Erda di dilê min de çend car hejiya..." Lewra tiştê herî girîng, erd e.

ÇAR: "Pirs, ne ewe ku emê çawa bi Tirkîye re bibin dost,…"

Di vê hevokê de sê şaşî hene, rastiya wê ev e: "Pirs, ne ew e ku em ê çawa bi Tirkiyeyê re bibin dost…"

PÊNC: "BINÇAVKIRIN:"

Piraniya Kurdên bakûrê Kurdistanê, vê peyva ku wergera ji Zimanê Tirkî ye, xistine nava Zimanê Kurdî û rojane bi kar tînin. Lê bi hezarê salan e ku ev peyv di nava Kurdan de wek "desteserkirin" hatiye bikaranîn kes guh nadê. Ji derveyê desteserkirina polîs û leşkeran, niha jî Kurd dibêjin: "Dest danîne ser filankeso…"

Jixwe di helbesta kurdî de şaşî, çewtî û bêuslûbî, gihane pileya herî bilind.

Lê ev hawe wisa nadomîne, wê rêyeke aram ji bo Zimanê Kurdî derkeve holê û wê sererast bibe, lê berpirsyariya herî zêde ya rewşenbîrên Kurd e.

Çîrok, Ew Dîwana Kurdan a Paşguhkirî

Ebas Mûsa

Kurd; zarokên cinan, nevîyên Kawayê Hesinkar û Rustemê Zal, berhema efsane û destanan, dêwên çîyayan, dengbêjên şeran, siwarên mehînên boz û çîrokbêjên şevbuhêrkan in.

Ji ber ku Kurdan di pêvajoya dîrokê de her dem guh nedaye nivîsê, anku derfeta bipêşvebirina nivîsan bi rengekî rewa bi destên wan neketiye, dîrok û wêjeya wan bi rengekî devkî hatiye ravekirin, ji lew re bi sedan çîrokên lehengî û evînê di rêya dengbêj û çîrokbêjan re gihaştine me.

Çîrokên Yûnanan ên mîna Iliad û Odyssey karîbûn dîrok û wêjeyê bi rengekî devkî li şûn xwe bihêlin da ku paşê bêne nivîsîn û nifşek radestî nifşê din bike.

Çendî Yûnanan karîbû helbestên xwe yên çîrokî di rêya nivîsînê re biparêzin, li hember vê yekê miletekî wekî miletê Kurd çîrokên bi vî rengî di rêya vegotinê re parastin û ji nifşekî gihandin nifşê din.

Ev yek heta radeyekê baş û bikêrhatî be, çi ku Kurdan karîbû mîratekî têrtijî û dagirtî li şûn xwe bihêle ku hîn jî dengbêj wan çîrok û destanan vedbêjin û em dikarin bibêjin ku Kurdî ji mêj ve wekî kaseteke bêsekin dengê xwe diherikîne guhên me.

Helbest û Çîrok Di Mem û Zînê De

Çîroka Mem û Zînê ya ku helbestnivîs Ehmedê Xanî di çerxa heftan de nivîsiye, bi rengekî helbestî hatiye nivîsîn lê ew bi xwe çîrokeke bedew, hevgirtî û xweşikhûnandî ye. Xanî di vê berhemê de destana Memê Alan bi helbestê vehûnandiye û jixwe sedema xebata wî ya di wî warî de ew bû ku Kurd bibin xwedan berhem û pirtûk.

Tevlî ku kirasê çîrok û destanên Kurdan bi xemla helbestê hatiye arastin, lê dîyar e ku bikaranîna helbestê ji bo hêsankirin û zûjiberkirinê ye. Ne tenê wisa, lê dibe ku ev rengê helbestî nêzî rihê civatên odeyan e, anku civatên Kurdan bi giştî.

Kurteçîroka Kurdî ya Nûjen

Wekî hemû tiştên nûjen, kurteçîroka nûjen jî hêdî hêdî derbasî jîyana wêjeyî ya Kurdan bûye, lê vê carê bi rengekî din ku ew çîroka Kurdî ya klasîk -heger em vî navî bibijêrin- ji cotkar û karkeran re dihat gotin û her weha ji mîr û paşayan re, lê çîroka nûjen û bi taybet a kurt ji nav civata qatjêrîn derdikeve, lê jê re nayê xwendin.

Di pêvajoya dîrokê de, zimanê Kurdî bi giranî wekî zimanekî devkî li ser pêyan maye û gava derfeta nivîsînê dît jî, ji hêla dijberên hebûna neteweyî û çandî ya gelê Kurd ve hate dorpêçkirin.

Bi domana demê re, zimanê Kurdî di sedsala 21'ê de ji nû ve vejiya, xwînerên xwe ji paş peredeyê derxistin û li ber ronîya rokê civandin û pê re divê were gotin ku ew tiştên ku berî nuha hatibûn nivîsîn, ji hêla derûdoreke teng a rewşenbîr û nivîskarên Kurdnivîs ve hatibûn xwendin.

Li vir jî, bêyî ku em pirsgirêka ziman -nemaze nivîsîna nûjenderxin holê, em ê nikarîbin li nivîsîna Kurdî rawestin, ji ber ku nivîsîna nûjen li ser risteke bilind a ziman dilîze û her wisa ji ber ku ev celebê nivîsînê ji boyî xwînerên zimanê Kurdî yên ku roj bi roj pir dibin, gaveke pêşeng e.

Kurtçîroka Nûjen û Jîyana Kurdî

Em dikarin bibêjin ku kurteçîroka nûjen wekî kirasekî hevrîşimî ye; hostayekî/nivîskarekî zana dihûne û zengînek/xwînerek li xwe dike/dixwîne. Ev nivîsîn dikare jîyana Kurdî ya psîkolojîk û sosyolojîk bi hûrbînî bişopîne û şikestinên nedîyar bi rengekî zîrek bide xuyandin.

Ji ber ku jîyana Kurdî tim di çîroka klasîk de bi pehlewanan û mêrên nemir pînekirî bû, ew şikestinên kesîn di kesayetîya Kurdî de di paşgotinan de ma.

Carcaran hin tişt di dengbêjî, stran û çîrokan de dîyar dibûn û gelek caran veşartî diman.

Heger kurteçîroka Kurdî ya nûjen tiştekî mezin ji wêjeya Kurdî ya devkî ya zengîn biribe jî; reng û kirasê xwe ji nivîsîna welatên Rojava aniye.

Ne tenê tîpên wê, lê belê guhdana wê bi hûrbînîyên jîyana psîkolojîk û sosyolojîk, bedewîya nivîsînê û hûnandina kurteçîrokê bi giştî.

Kurteçîroka Kurdî û Girêka Kor

Di navbera kurteçîroka nûjen a ku mercine wê yên taybet hene -da ku karîbe bigihêje rêza kurteçîroka cîhanî- û çîroka klasîk de gelek girêkên kor hatine girêdan û hin nivîskar ketine nav girêkên di navbera her duyan de.

Pê re ew nedikarin çîrokeke rengeklasîk binivîsin da ku bi rengekî devkî were gotin û ne jî dikarin kurteçîrokeke nûjen binivîsin ku karîbin jîyana Kurdî bişopînin û bi rengekî nivîskî bidin destên cîhanê.

Jîyana Kurdî li ser destên çîrokan rabûye û hatiye ravekirin, ji lew re çîrok dîwana Kurdan e; di hundirê wê de wêje, dîrok, kesayetî û hebûna Kurdî bi temamî nivîstî ne.

Hisên Îbiş… Nêçîrvanê Parzemîna Reş

Luqman Hisên

Hisên Îbiş kî bû? Ji kû bû? Çi kir, û çi nekir?

Gelo ji Kurdîtiya xwe re kiriye, yan na?

Em ê niha ji xwe re li nav baxçeyê Hisên Îbiş bigerin, ka em ê li çi rast werin?

Ew mirovê ku bi sedan ji pezkovî, xezal, şêr, piling, yek sitirih, gamêş, fîl, zûrafe, beraz, kerê berî, gur, çêlek û tiştên ku li Efrîka û Hindê ketine pêşiya wî kuştine, li beriya Engiltera lawir û ajalên xwe tev pûç kirine, û bi dermanan ew pêçane û paşê ji wir anîne Şamê...

Hisên Îbiş kurê Ehmed Îbiş e. Di sala 1884'an de li Şamê ji dayîk bûye.

Ji êla Kîka ye, malbata wî ji Amedê ber bi Şamê ve hatiye û li wir bi cî bûye, lê kengî û ji ber çi dev ji welatê xwe berdane û berê xwe dane koçberiyê, ew jî ne diyar e.

Lê tiştê diyar ew e ku ew di dema Osmaniyan de ji welatê xwe derketine, bê guman dê ew jî wekî piraniya malbatên Kurd ên li Şamê ji ber zilma Osmaniyan revîyabin.

Min ji hin kesê malbata Hisên Îbiş li Şamê pirsa dem û sedema hatina wan ji Amedê kir, lê mixabin ji min re gotin em nizanin kengî me dev ji welatê xwe berdaye, lê em dizanin ku kalikê me xwediyê gelek gund û erdan li derdora Şamê bû, û ew di dema xwe de yek ji zengînên Şamê bû..

Ehmed Îbiş di dema xwe de yek ji maldarên Şamê bû, lê tenê du kurên wî hebûn, yek Hisên û yê din jî Nûrî bû..Ehmed Îbiş di wê çaxê de xwediyê çar gundan ji gundên Xûta Şamê bû, ew jî ev bûn:

1-Elheyecane
2-Elbêtariyê
3-Elxezlaniyê
4- Dêr Hecer.

Hisên Îbiş di sala 1906'an de bawernameya bazirganiyê ji zankoya Emerîkî li Beyrûdê wergirtiye. Piştre keça Ebdurehman Başa Elyûsiv ê ku di wê demê de Serokê Meclis Elşûre û Serokê Mehmel Hec Şam Şerîf bû, ji xwe re aniye. Ebdurehman Başa neviyê Se'îd Başa Şemdîn bû, ew jî kurd bûn..

Piştî ku Osmanî ji Sûryê derketin û Meclis Elhukim di sala 1919'an de hate damezarindin, Hisên Îbiş yek ji endamên wê meclisî bû, lê xuya dike ku Hisên Îbiş nedigot ez Kurd im an jî nedihate naskirin kû ew Kurd e.

Peywendiyên Hisên Îbiş bi piraniya rewşenbîr û welatparêzên Ereb ên wê demê re hebûn..Lê tiştê ku ji dîroka Hisên Îbiş tê xuyakirin, wî nêçîra li çol û çiyan di ser mafê miletê xwe re girtiye û doza Kurdî paşguh kiriye, û nexwestiye ku serê xwe bixe tehlûkeyan ji bo miletê xwe, ji lew re wî ji sala 1904'an ve cara pêşî berê xwe daye beriya herêma Hesekê bi mebesta nêçîrê, û hin ji malbata xwe jî daye dora xwe û demek li wê beriya bêxwedî bihûrandiye. Lê car dî tê xuyakirin ku nêçîra li beriya Hesekê ew têr nekiriye, ji lew re di sala 1914'an de berê xwe daye welatê Robson stiranvan û xebatkarê miletê xwe ,Parzemîna Reş.

Ji wir jî Hisên Îbiş çûye Hindistanê welatê Xandî ,welatê berxwedanê, lê ne ji bo ku ew ji ber miletê xwe perwerdeyî rengê berxwedanê bibe, na..

Hisên Îbiş çar caran çûye Efrîka û Hindistanê, her carekê sê salan maye. Bê guman di duwazdeh salan de li Efrîka û Hindistanê, vî xweşmêrî bi sedan Xezal, pezkovî, şêr, piling , fîl, zûrafe, çêlek, beraz, gamêş, kerê berî û çi ajala li pêşiya wî derketiye, wî ew kuştine û ji wir birine Birîtanyayê, li wir hemî pûç kirine, û piştî demeke dirêj keda xwe ya duwazdeh salan ji Birêtaniyayê di rêya deryayan re bi gemiyê aniye Sûryayê.

Lê diyar e ku li Sûryê tu guhdan li keda wî nehatiye kirin û nejî alîkarî ji aliyê dewletê pê re hatiye kirin.. Gelo ji ber ku ew Kurd bû guhdan lê nekirine yan sedemine din habûn? Em nizanin...

Hisên Îbiş nêçîrvanekî bi nav û deng bû, û gelek welat hebûn ku dixwestin Hisên Îbiş nêçîra xwe bide wan û tiştê ku wî bixwesta dê bidanê.. Pir tiştên kû Hisên bi xwêdana aniya xwe û di nav tirs, gerim û sermayê Hindistan û Efrîkayê de kirine, û bê kû hikumeta Sûrî wereqeyekî bidiyê, wî tev anîn Şemê û bi hêsanî li ber piyan çûn ji bê guhdanî û bêxwedîtiyê..

Xuya dike yê ku welatê wî nebe, xebata wî ne ya wî ye û ew çi bike dimîne winda, yan winda dibe û di nav lingan de diçe.

Hisên Îbiş jî xwe li welatê xwe nekir xwedî, lê kesî jî guhdan bi dîroka wî nekiriye, tevlî ku dîroka wî balkêş û cihê seknê ye.. Tevlî ku malbata wî di demên bûrî de gelek hewildan kirine, xwestine wî û xebata wî ya nêçîvaniyê ji tariyê derxin, lê mixabin kesî destên alîkariyê nedane wan, û hewildanên wa ber bayê çûne, çawa ew ajalên ku wî ji Efrîka bi xwe re anîn Şemê û li Şamê winda bûn, ew jî wisa lê hat.

Li gor ku malbata wî ji min re got, wan pir dixwest ku ew keda wî ya salan li ber germa Efrîka, sermaya Hindistanê û pêşiya Engiltera ji tariyê ber bi ronahiya mediyayê ve derkevin, lê her ku deriyek vedikirin, deriyekî din li pêşiya wan dihate girtin..

Hin caran malbata Hisên Îbiş keda wî di malên xwe de şanî



xelkê dane, lê keda wî ji wê yekê mezintir e ku di malan de şanî milet bibe..Carekê di sala 1936'an de li Pêşangeha Şamê ya Navneteweyî, ji kîsî wî hatine raxistin, bê kû hikûmet alîkariyê pê re bike.

Malbata wî dibêjin çaxa ku Hisên Îbiş keda xwe ya duwazdeh salan li Birîtanyayê danîbû ji bo ku xira nebin, pir pere lê didan, ew jî tev ji berîka wî bû..

Gotin li ser vî xweşmêrî û xebata wî bi dawî nabe.

Hisên Îbiş yek ji wan kesên ku di dema xwe de li ser tiliyan dihatin jimartin.

Hisên Îbiş maldar, rewşenbîr, nêçîrvan û bexçevan bû, ji lew re wî gelek xelat ji Ferensa, Birîtanya û Sûryayê wer girtine. Xelata melevanî, siwarbûna hespan, avêtina guloka hesin, embûşiya lîstika hêzê wer girtine, û hin ji bo xebata wî di warê çandiniyê de.

Û wî kasa Ereban a gokê bi navê Sûrî wergirtiye û Melek Faroq Melikê Misrê daye destên wî...

Malbata Hisên Îbiş dibêje ku Hisên yekemîn kes bû ku gok derbasî Sûrî kiriye, û hîna ew gok li cem malbata wî ye..

Hisên Îbiş dibistanek li gundê xwe Elheyecana çêkiribû, û xwendin tê de belaş bû.

Çaxa ku Celadet Bedirxan hatiye Şamê, Hisên Îbiş hezar donim erd li gundê xwe yê bi navê Hêcana dayê, da ku xwe bi wî parçeyê erdî xwedî bike..

Xezûrê wî Ebdurehman Başa Yûsiv, di wê demê de nexweşxana İbin Elnefîs daye hikumetê.

Hisên Îbiş du kur û du keç hebûn:Yûsiv li zankoya Emerîkî xwendina xwe bi dawî kiriye û li Emerîka maye ta çûye ser dilovaniya xwedê.

Ziyad jî li zankoya Emerîkî xwendina xwe bi dawî kiriye, ew niha li Şamê ye .

Keçika bi navê Ehsan jî wek her du birayên xwe xwendina xwe li zankoya Emerîkî li Beyrûdê bi dawî kiriye, li wir maye û li wir çûye ser dilovaniya Xwedê. Omeyma ne kêmî her sêkan bû, wê jî li zankoya Emerîkî li Beyrûdê xwendina xwe bi dawî kiriye û niha ew li Şamê rûdine..

Nûrî Îbiş birayê Hisên Îbiş e :Nûrî du bawername ji zankoya Emerîkî li Beyrûdê wer girtine, yek a bazirganiyê û yek a çandiniyê .

Nûrî Îbiş di dema Serokatiya Hisnî Elze'îm de bûye Wezîrê Çandiniyê û di dema serokatiya Edîb Şîşeklî de bûye Wezîrê Navxweyî, demekê bûye karbidestê êlên Sûrya di dema kû êla Begara ya Ereban û êla Kîkan a kurdan li beriya Hesekê bi hev ketine.

Malbata wî dibêjin wê çaxê wî di navbera her du êlan de lihevhatin çê kir û erd li wan par kir, anku li ser destên wî lihevhatin çêbûye .

Malbata wî dibêje em ji êla Kîkan, ji beşê Cemikan in...

Di sala 1967'an de Hisên Îbiş çû ser dilovaniya Xwedê û ew li goristana malbata wî ya li Taxa Kurdan li Şamê bi cî kir.

Ez çûme pêşangeha ku keda wî tê de hatibû raxistin, lê bi rastî dîtin û gotin tu carî nabin wek hev, lê mixabin di wê pêşangehê de tiştek nehatibû nivîsandin ku mirov zanibe xwediyê wê kedê Kurd e, û li cihekî veşartî hatibû çêkirin, mirov digot qey bi dizî ye..

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî...Şêro Dalînî

Tu

Stran û şevişan î
Kelha di nav rewrewka asîman î
Diho bû
Min ê ji te re
Gotin bi gotin
Ber bi helbeşta te ve
Straneke bicoş bigota
Min serguhên xwe re nebavêje
Di devê min de
Henase
Girêkên xirboqî ne ji qeşayê
Nexweziya bi par
Û ne heft xwezî bi nuha
Xweziya bi kurtekenekî
Taştêya her roja teng

Binxet

De were tu wisa bi dengê min ve
Girêdayî yî
Ji hemî keseran re kanî
Nivîn î ji hemî xewnereşan re
Di xew de Binxet
Xwe zer dikim xunava dêman
Di bin rûyê xwe de
Xwe ji girî
Dikujim
Berxikê te yê birçî
Ez im
Welat
Ji mijankên çavan jî
Nêzîktir î
Binxet
Gunehê sitranê çi bû
Min navûnîşana xeman dihêlî
Bi bez di refên hacîreşkan de
Li te digerim
Di cirnikên çavan de
Ji hemî laveyan re çavkanî
Baweriyê bi girnijînê neyê
Ji tiliyan
Baranên germ
Li cênîkên te
Dibarînim

Di sala 2011'an de pirtûka wî ya yekemîn a bi navê "Parastgeha ji kefê ya te ye" hatiye çapkirin.Di sala 2016'an de dîwana wî ya bi navê "Û hêdîka hun ê ji kirasê xwe derkevin" derket.

Xwe
Li dilê xwe bipêçe
Razên xwe
Bi xwêsiyeke zuha
Di guhê şevekê de
Bibêje
Û çavên xwe bigre Binxet
Havîn
Û xwêdana ji eniya rojê
Dilop-dilop dibariya
Sere cotmemikên te
Zarokên min yên bêpizanin
Ji comerdiya awirên te
Yên sar
Yên jar
Yên har
Ne nankor im
Baweşên
Destê raştê ye
Dikim ku bimirim
Tasa meyê
Bi ser xwe de
Xwe ser av dixim
Cirnikên çavan tijî xwê
Li te digerînim
De were
De were Binxet
Û bikuje henaseyên mayî

HÊVÎ

Digote min:
Careke din jî
Wê roj derkeve
Min jî digot:
Ji xwe ez jî
Li wê hêviyê me.

BÎNA HAVÎNÊ Û XWÊDANA ENIYA TE

Di şevbuhêrekê de
Dengê keç û lawan
Coşeke mezin didane çepikan,
Dema ku tu hatî bîra sitranê
Laveyên bêşens
Bi tena xwe liviyan
Hemî deng
Û hemî reng hatin birîn
Û min
Minnnn
Nikarîbû li wêneyê te
Xwe bar bikim
Min nikarîbû xwe,
Zarokek bûm

Şêro Dalînî, di sala 1983'an de li bajarê Qamişloyê ji dayîk bûye. Li dibistanên bajarê Qamişlo xwendina xwe qedandiye. Ji sala 2014'an ve li Almanyayê dimîne.

Li awirên te diterpilîm.

ARMANCÊN ASÊ

Mala bavê te sêqorzî ye
Û bi ser de jî
Perdeyên te hesinî ne!
Li henaseyên min barkirî bûyî
Di çavên min de jî
Min sed carî got:
Min têra te helbest ji şevê re
Amade nekirine
Û stran jî nebijartine
Ne kopal im
Û nabim qelûna tu kesî
Gotibûn! Ku navê min li te kiribûn
Tu hewqasî dûr
Ez bê liv û bêdeng
Bîna te ji kolanê dihat
Ji odeya min jî
Ji min re
Weke ku qey sal gerek bûn
Da ku nivînekê,
Maseyekê
Yan stranekê vedim
Ji xwe min nikarîbû xwe bişom
Stran jî kin bû
Wek şewta gezekê bû
Navekî din li te nakin
Ez ê jî
Di kolaneke din de
Di odeyeke din de razim

BAVÊ MIN

Di bexçeyê berberoyan de
Yê herî bilind
Tu yî



Xîza-xîza dilê te
Yê ku ji bêrîkirinê sincirî
Dengê te yê barkirî girî
Bi çarlepkan
Dilê min dibije
Hemî zirt û gefên te
Yên ji qijik û roviyan re
Ditirsim ku bêriya te nekim
Gulgenimên min neseridin
Dilê te şîn e yabo
Û xwîna te kesk e.

BÎR

Ew ne çîrokên min in
Nivîsandî hatin
Rêyên ku min dajotin
Ew peyamên ku dihatin nivîsandin
Û xwendin ne yên min bûn
Û ew cil û bergên di bîroyê de jî
Ne yên min bûn
Min hîn penîr bi şebeş re
Nexwariye
Çermê ji taverojê terikî
Di bin girseya dara tûyê de
Yê min e
Belalûkên ku digotin
Ji mîza beqan in
Yên min in
Pora ku bi girî re
Dihate hunandin jî
Ne ya min bû.

Pirs...û bersiv

Pirsa min ev bû:
Tu çi ji min re dibêjî piştî
Qerimîna çav û hestan.
Gote min:
Bersiva min jî ev e,
Ez ê destmaleke sipî
Bidim destê te.
Min got:
Hewceya wê çi ye?
Gelo ez ê
Li sergovendiya xwe
Wê bihejînim

Yan jî

Şêro kirasekî sipehî li helbesta xwe bar kiriye, bi gotinine nerm û hêsan malikên helbesta xwe bi teşeyekî nûjen hûnandiye.

hêsirên bê dumahî
Li pey çûna te
pê zuha bikim.
Gote min:
Nizanim
Û ji hingavtina germahiya
Destên wê
Mame termekî
Li şûna xwe wêneyan didêre.

Bi Şev

Li cem me...
Gera bi şev qedexe ye
Û dibe ku ya diza be,
Di dilê min de heye
Ku xwe qedexe bikim
Û bême diziya
Du lêvên te.
Li ber deriyê mala we
Di dema razana çavbirçiyan de,
Rûyê xwe
Bi boyaxa lêvên te bişom,
Destên xwe bi newqa te ve
Dîl bikim.
Hest bikim
Çendî tu
Ciwan û nazik î
Mest bibin û bibin peykerek.
Bayekî nû

Bayekî nû

Bi gotina evîndar bûme
Ji nav her du lêvên te
Pelên dara min
Li ber ba kirin,
Bablîsokên dîn
Li kolanên gundê
min yên teng çandin,
Û buharek bi lehiya sosinan
Herikand .

Destên xwe hêlan dikim
Bi ser zozanên bejna te ve
û,
Di wê demê de
Nêrgizên bejna te
Bîna wan min
Serxweş kirin.
Gotinên min yên tazî
Li çavên te yên şil
Diterpilin ,
Zimanê xwe
Di şikefta devê te de
Winda dikim.

Mija pora te
Tiliyên min dorpêç dike
Û min davêje
Zindana hembêza xwe.

Ez ji te me

Bi vî zimanê jêkirî
Û di şeveke ku stêrik bi hev re
Di zindana şevê de
Hiştine ,
Çîrokên kevin
Ji hev re dibêjin
Di guhê te de dibêjim:
Te ji xwe bêtir hez dikim
Derewa nakim
Li pereyên nanê xwe
Nema sergerdan dimînim,
Tenê xwesteka min ya sereke
Çinîna gezoya bi lêvên te ve ye
Taybetmendiyên xwe
Nuha ez ê bidim hev
Û vegerim
Ser kavlên bav û kalên xwe
Yên dilşikestî
Yên ku jiyaneke bi poşmanî
Ji çavên te xeritandin,
Ez li vir li wan nehatime
Ne ez û ne hevalên min jî
Naxwazin jiyanê
Ji mîrê dezgehan
Parse bikin
Tu ji min pê ve ti kesî nabînî
Her wiha
Çavên min rê nedane hêsiran
Ku bibarin li ser ti kesî
Ji bilî te pê ve,
Bi te hêz tê min
Wêneyên te
Ji mêjiyê min nakevin,
Gemiyek şikestî û
Bi kerwanê rêwiyan re
Newq nabim
Bêyî te
Buhiştê jî navim.

Rûyê te

Dixwazim wêneyên di helbestan de
Wergerînim zimanekî din
Ji gotinên te
Helbestan li ezmanan
Belav bikim,



Ji rûyê te
Gulavê biçinim
Ji kenê te
Awazan bihûnim
Ji lêvên te
Tîna rojê bidim hev,
Bi agirê genimê memikên te
Bênderên keseran bişewitînim
Di himbêza xwe de
Min di tora qîrîna xwe de
Tarûmar bike
Bigrî,
Bikene,
Serxweş bikeve û raze
Siwarê xewnên te yên şêrîn ez im
Dilsojiya te ez im
Gozelê firişta xwe ez im.
Kesên ku çavdura min bibînin
Dibe ku bipirsin nameya te çi ye?

Dilniya bibin
Û bejnên xwe xwar bikin.
Min sûcdar nekin û nedin girtin
Di zindanan de
Ji rewa çavên wê
Min sêwî nehêlin
Ez ji wê hez dikim
Ji vê hez dikim
Ji te hez dikim

Roj baş

Dengê te bû...
Di hinavên xewê de
Bi nermikên guhên min ve
Ken û gazin
Kenekî nerim dikir,
Wêneyên te bûn
Di kûrahiya
Çavên min de
Sitêrik dineqişandin
Seyran û tinaziyên xwe dikirin.
Hilma te bû...
Mina beytikekî reviyayî

Bi saya sitrana Kurdî ew nêzî helbsta Kurdî bûye, û tenê bi zimanê Kurdî dinivîse. Ji bilî helbestê ew li tenbûrê dide, û bi awayekî modern sitranan jî dibêje.

Di tengbûna dilê min de
Xwe digevizand,
Dil dibijiya kenê lêvan
Ber bi wan ve diçûm
Li balgiyên veçirî terpilîm
Şiyar bûm
Ooh .. xewn e
Min tu
Çixareyek û vêxist.

Xatireke dereng

Di beşdariya te de
Dipûnijim...
Û bi besta gotinan dikevim
Stewrbûna wan dimalim
Şihîna wan gur dikim,
Û li wan siwar dibim.
Kesereke ji qeşayê zayî
Ji sîngeke bijartî ji te re,
Tu tê de dihilweşî
Û dibî kavilekî bêreng û bîn.
Ji te bar dikim
Ji nû ve
Yeko-yeko
Xwe xweser dikim,
Dûrî hêcbûn û mestbûna
Gotinên te yên har,
Û nêzîkî tîna agirê nûrojeke nûhatî.
Careke din
Zingilê gotinên min
Yên ji şevên lal re mêvan in
Guhdar û şîrove neke;
Ew nema ji kenê te re
Qelen in.

Lêpirsîneke cuda

Bi lepên xwe
Yên ku ji diziyê pişikî bûn
Rûyê min
Divemirandin
Dimirandin ,
Volkana di paşila min de
Dest bi sirûda xwe dikir
Ez gur dibûm
Li baskên min digeriyan
Diketim
Diçilmisîm .

Ji xwedê natirsî

Tu diçî
Bîstekê min dihêlî
Perengên di sînga min de
Dest bi nimêjên xwe dikin
Tiliyên tembûrhez...
Ji ebrûyên te xwînî bûne
Wêneyên te min kor dikin...
Bi ezman ve
Bi roj û axê ve ne
Li ser rûyê zarok û kalan in
Bîstekê min dihêlî
Ji xwedê natirsî,
Navê te
Xwe li zimanê min dipêçe
Ji her gotinekê re
Dûvik e,
Pora te ya kildizî
Nahêle ku
Roj ji xewê şiyar bibe

Bîstekê min dihêle
Ez ê çawa
Çavên birçiyên
Dîtina yarên xwe
Bigrim ?
Çawa
Bi zimanê girêdayî bibêjim:
Tu ya min î
Ez ê çawa
Bi tiliyên birîndar
Te hembêz bikim?

Dîdar

Bi kenê ku min ji meyxaneyan pars kiriye
Buxçikên dîdarên nediyar

tije dikim.
Ditirsim hunandina
Hevokên me
Ne lihevhatî bin,
Lê...
Zimanê xwe min nimandiye
Ji bo çandina damrê hêviyên te
Çira korbûna te ez im
Dilsojiya te
Ya min e.
Pora te...
Ez ê bikim gulîk
Û bi rojê re em ê bikenin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kurdî Xweş e.

Karîn	امكانات
Pesinandin	توصيف
Hevrûkirin	مقارنة
Pûnijîn	شرود_تركيز
Rastalî	يميني
Çepalî	يساري
Diravdan	تمويل
Derbasgeh	معبر
Rêbend	حاجز
Pişk	حصة

Gotinên Pêşiyan

Havîn bavê rêncberan e
Jina çê, hêja ye dinê
Destê bi tenê, rûyê mirov reş dike
Mirin ji tirsê çêtir e
Havîn xweş e li bin siha daran
Li cihê ku hêvî hebe jiyan heye
Qenciya ne di cihê xwe de bela ye
Tûrê xizanan tim qul e
Zêrker bi qedrê zêr dizane
Her kes li gor şîrê xwe dike

Pirsname

Kevintîrîn şikeft li Kurdistanê kîjan e?

Şoreşa Şêx Se'îd di kîjan salê de bû?

Bersiva Pirsên Çûyî

Sirûda Keçan a helbestvan Mele Ehmedê Namî ye.

Yekem pakrewanê rojavayê Kurdistanê Silêman Adê ye.

Mamik

1- Çeq meq e, laq û peq e, heçî dest bideyê ehmeq e, çi ye?

2-Tasek şîr dide, lê bê guhan e, çi ye?

Bersiva Mamikên Çûyî

1-Sîwan

2-Genim

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2			■						
3				■	■	■	■	■	
4				■					
5			■						
6						■			
7	■	■							■
8				■					
9								■	

Sitûnî

1_Bajarekîbakurê Kurdistanê_Du tîpên wekhev
2_Kesê destek û piştgîriyê dide mirovekî_Du tîpên wekhev
3_Hêrangeh(Vajî)_Term belavkirî
4_Du tîpên wekhev_Nan belavkirî
5_ Du tîpên wekhev_Şeytan bealvkirî
6_Du tîpên wekhev_Ap_Xanî
7_Du tîpên wekhev_Navaşo belavkirî
8_Du tîpên wekhev_Qehir û zorî
9_Mehkeme _ Du tîpên wekhev

Asoyî

1_Xwedî bawerî û îman
2_Sembol û nîşaneya welatan_Netweyeke ku li nêv Kurdan dijîn(Pirjimara gelêrî)
3_Ji ajaln(Vajî)
4_Mak belavkirî_Kesê çêlekan diçêrîne(Vajî)
5_Du tîpên wekhev_Ne xasim
6_Nerîn belavkirî_Melek
7_Siyasetmedar(Vajî)
8_Tabiq
9_Bajarê Evînê

Dermanê Pêvedana Kelmêşan

Demsala Havînê tê, û pêvedana kelmêşan jî bi xwe re tîne ku li seranserî cîhanê xelk jê gazindan dike, lê xuya ye ku çareserî ji vê pirsgirêkê re jî heye.

Malpera Layv Heker ku guh dide çareseriyên tenduristî, belav kir ku ji bo pêvdana kelmêşê çareyeke hêsan û lezgîn heye.

Ew jî bi êxistina kevçiyekî nêv ava germ ji bo demeke kurt, paşê danîna pişta kevçiyî li ser cihê geza kelmêşê, û guvaştina kevçî li serê, bi tenê ji bo du xulekan.

Malperê tekez kir ku bi vê pêrabûna hêsan, dê cihê pêvedanê rehet bibe û dê xura çermî jî nemîne.

Sitêrname 1

Narîn Omer

Dîroka me bi kesên afrêner û ciyawaz, di hemî zeviyên jiyanê û bexçên wê de zengîn e, ji ber ku ji wan huner çiqilekî herî girîng e, em navê gelek hunermend û dengbêjên dilsoz û jêhatî dibînn, lê mixabin ew di reştariya windabûnê de veşartî mane, nemaze yên jin, ez bi hêvî me ku bikaribim çirûskên ronahiyê li ser wan vedim.

Gula Ermenî, yan Gula Keşe, di sedsala nozdehan de yek ji wan dengbêj û hunermendên bi ciwaniya xwe, û bi deng û nazikiya hestan ciyawaz û navdar e, nemaze gava ku navê wê bi navê dengbêjê navdar "Evdalê Zeynikê" ve hate girêdan.

Çîroka wê û Evdal:

Du çîrok li ser evîniya wan hene: Dibêjin Evdal li gundê Gulê ahenga zemawenda malbatekê li dar dixist, û ji nişka ve çavên wî bi Gulê dikevin, û dilê wî bi çavan re semadar dibe û berê xwe dide xwediyê ahingê û wiha diaxive: "Ez hatim li ba we saxlim, nûşîncan û hişmend; dema çavên min bi vê keçikê ketin ez bero cîhaneke dî ve şopandim, bi Xweda ez ji vir naçim eger tu wê ji min re nexwazî".

Malbat daxwzê qedexe dike, lê Evdal bêzar namîne, wî zanîbû ew ê bi dengê xwe yê ku çiya dihejîne wê bikaribe derbasî dil û hişê wê bibe. Daxwaza wî bi cih tê dema ew û Gulê di şevbiwêrka bi nav û deng de li hev dicivin û distirînin, Gulê ji dil û can jê hiz dike û şahiya şûkirina wan li hemî hêlên Kurdan deng dide.

"ev çîrok di Romana nivîser û romannivîs Mihemedê Ozon de hatiya gotin".

Çîroka didwan, dibêje ku Gulê jî hizkirina xwe ji Evdal re eşkere dike, û jê dixwaze ku ew bibe hevjîna wî, lê Evdal qebûl nake, ji ber ku ew hevjîndar bû, yan jî Gul ne ji ola wî bû, yan jî malbata Gulê erê nekir, çimko ew xwedî jin bû û ne ji ola wan bû.

Çîrok çawa tê gotin, a girîng ew e ku navê wan di dîroka çanda Kurdan de hatiye xemilandin, û çîroka evîniya wan weku du evîndarên yek can û yek dil hatiye nîşandan.

Dibêjin ku Gulê jineke rind, zanyar û vîndar bû, lewma ew cihê rêz û rûmetê bû di civaka gel de. Tevlî van tiştan hestnazik û peyvxweş bû. Dengê wê mîna solafên Kurdistanê zelal û bi pêl bû, û karîbû bi demjimêran dengbêjiyê berdewam bike, lewra dema ku Evdal tu kes ji dengbêjên ku li hember wî rawestin û bistirînin nedît, Gulê ev yek kir, sê roj û sisê şevan, û hin dibêjin heft roj

Gula Ermenî, Gula Keşe

û heft şevan li pey hev li berambar Evdal sitrand.

Zayîna Gulê: Bi rastî tu zanyariyên durist li ser rojbûn û koça wê ya dawî bi dest min neketin, lê rêzdar Mihemedê Ozon dibêje: "Dema wê û Evdal hev dû nas kir, ew pazdehsalî bû û Evdal sihsalî bû"

Eger Evdal di navbera "1913-1800" jiyaye, helbet Gulê jî di sedsala 19'an de jiyaye û çûye li ser dilovaniya xwe, ji ber tu zanyariyên nîn in ku ew jî temenen dirêj bû.

Ew ji gundê "Xamûrê" bû.

Gula Ermenî, tevlî ku ew ne Kurd bû jî, dimîne finda hunera Kurdî, lê evînî dikare hemî tiştan vajî hev bike, û ji nemanê çiraxên hebûnê vede û ronî bike. Silav û aramî li giyanê wê Gula jinên kurdan.

Pêkenok

Diziya Mirîşkan

Carekê du mirovên diz, çûn diziya malekê.

Çawa ketin malê, dîtin ku deriyên odeyan girtî ne, hema di cî de berê xwe da kozika mirîşkan.

Yek ket kozikê û yê din jî çû serê kozkê.

Yê di kozkê de hêk û mirîşk derdixistin û didan hevalê xwe yê li jor, her cara ku mirîşkek dida hevalê xwe, digot:

_Bigire bira, em ê îmana mirîşk û hêkan teneke bikin.

Ji nişka ve xwediyê malê hat, yê li ser kozikê reviya bêyî ku bêje hevalê xwe ku xwediyê malê hat.

Dizê di kozikê de derket, dît ku xwediyê xênî li raserî wî sekiniye.

Devê wî li hev ket û gotê:

_Bi Xwedê xalo ne ez bûm.

Xwediyê malê dizê xwe girêda û çû ku hawarê bigihîne cîranan.

Ta ku xwediyê xênî li gel cîranan vegeriya, dît ku dizê wî xwe vekiriye, sola wî ya nû jî diziye û reviyaye.

Serpêhatî

Bersiva Xaçepirsa Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	a	v	■	m	a	r	d	î	n
2	l	a	l	e	ş	■	■	b	a
3	a	l	a	■	■	d	d	■	t
4	n	a	l	î	n	■	d	a	s
5	■	■	■	r	e	k	■	i	i
6	m	î	■	a	y	e	r	e	d
7	î	r	a	n	r	p	e	■	r
8	x	a	k	■	n	i	d	r	u
9	■	■	■	k	e	r	k	û	k

Marê Qut û Gora Sipî

Dibên merivek rezekî wî yê baş hebû, marek di bin rezê wî de cihê xwe çêkirbû. Çi sibeha ku biçûya nav rezê xwe, ewî marî zêrek li ser riya wî datanî.

Demeke dirêj wî û mar bi hev re bihurandin, dibê tumayî ket dilê xwedîyê rez, got: Eger gencek (yanî xezînak) di bin vî marî de tuneba, her roj zêrek nedavêt ser riya min, divê ez vî marî bikujim û bin cihê wî vedim, gencê tevdî ji xwe re derxim .

Sibehê rahişt tevrikê xwe û berê xwe da rez wek her car. Mar wek berê zêrek jê re danî û vegerya, lê berî ku mar bighê cihê xwe mêrik tevir danî mar, wek buhustikê ji terya mar birrî, û mar çû cihê xwe.

A dina rojê kurê mêrik hate nav rez, mar ji paş ve hat û bi kurik veda û kurik kuşt. Nîro bû, kurik nehat mal, dê û bavê wî lê gerîyan nedîtin. lê yekî gundî got min vê sibehê kurê we dî çû nav rez. Dema hatin nav rez dîtin ku mar bi kurê wan vedaye û kurik miriye.

Xwedîyê rez rabû gora lawê xwe di nav rez de kola û veşart û qubeke sipî li ser gora layê xwe ava kir .

Rojekê xwedîyê rez û yekî gundî hatin nav rez, mêrik li hember cihê mar sekinî û banê kir"Birayê mar were wek berê em ê bibin dostê hev"

Yê gundî lê vegerand û got: Ma hûn ê çawa ji nû ve bi hev bawer bibin, tirba sipî û marê qut .